Patientinformation - Kurdiska(kurmanji)

Ji bona te yê ko testê didî

Divê tu wek nexweş pir caran testê bidî, bo nimûne testa xwînê an testa tevna laş. Herweha di dema kontrolkirina laşsaxiyê de jî ya ko encumana wîlayetê wê pêşkêş dike test têye birin.
Hin test bi awayekî rutînî di ya ko bi nav biyobankekê de ye têne parastin. Biyobankek ew cihê civandina testan e – testa xwînê, testa şaneyan an testa tevna laş – ew di lênêrîn laşsaxiyê de têne birin û ji du mehan dirêjtir têne parastin, ew bi kesekî ve girêdayî ye.

Ji ber vê divê test bête parastin

Gelekî giring e; ku testên te bêne parastin; da ku em karibin bi vê rabin
– dema ku em careke din li testa te bigerin bo nimûne dema ku tesîra dermankiririnê tune be,
– danîna destnîşankirineke misoker di riya danberheva testên nû li gel testên parastî,
– bi rêkirina testê ji taybetmendekî din re ji bona biriyardana li ser,
– nexşedanîn û rê lêgirtina vegirtina nexweşiyê
– kontrolkirin û bi pêşxistina awa û rutînên me
– perwerdekirina personalên lênêrînê
– pê rabûna lêgerîna bijîşkî; da ku em karibin bi çakî rê li nexweşiyan bigirin û wan derman bikin.

Weha agehdariyên kesîn û testên te têne parastin

Testên te yên parastî têne hilînandin ku destên tikesî din bi bêheqî negihîne wan. Agehdariyên kesîn yên ko bi testê ve girêdayî ne; ew di dosiya nexwşan de û di qeyda taybetî de ya li ser testan e têne nivîsandin. Agehdariyên te yên kesîn li gor qanûna bi dizîbûnê têne parastin, qanûna qeyda lênêrînê û qanûna agehdariyên kesîn.
Ji ber ku qedexe ye; testên ji mirovekî/ê têkevine bazarê, nabe ku testên biyobankê ji bona qezencê bidine der.

Lêgerîn

Dibe ku ji hin testan re bihayekî bilind ji lêgerîna bijîşkî re hebe. Divê destpêkirina hemî projeyên lêgerînê ji aliyê komîteya etîkî/sînçî ve bêne tesdîqkirin ku ew biriyarê li ser projeyekê dide ku ew ji bona lênêrînê giring e, ku dibe dest bi wê bibe bê ku pê li întegrîteta kesîn bête kirin.

Tu bi xwe biriyarê didî

Tu wek nexweş mafê te heye ku tu dixwazî çawan testên te bêne bi karanîn. Qanûna biyobankê dibêje ku divê tu agehdariyê bigirî razîmendiya xwe bidî nîşandan ku tu dixwazî çawan testên te bêne hilînandin û ji çi re bêne bi karanîn. Ger tu qayîl bibî ku testên te bêne parastin; her tim mafê te heye; kengî tu bixwazî; tu dikarî biriyara xwe biguhêrî. Bi tenê poşmanî di biriyardana ku nabe test bête parastin de nîne.
Li gel birina testê ji te tê pirsîn; ma bi razîmendiya te ye!. Ger tu jê ne bawer bî û dixwazî li ser biriya xwe bifikirî, em şîretê didin ku test bête parastin ta ku tu razîmendiya xwe didî nîşandan. Paşê tu dikarî kengî tu bixwazî razîmendiya xwe biguhêrî; di riya ku tezkereya-na re bişînî, tu wê di dema serîlêdanê de digirî.

Agehdariya pirtir

Dema ku tu agehdariya pirtir bixwazî, tu dikarî ji bijîşkê xwe bipirsî.

Regionalt biobanksregister
Universitetssjukhuset i Lund
221 85 Lund
Tel: 046-17 75 19

2005-01-14